# ÇALAKÎYÊN JI BO AMÛRA ÇANDÎ
## ÇEM JIYANÊ NEXŞ DIKIN

Çalakî divê balkêşî û hewesê çêkin, û mirovan vexwînin ku ew xwe bidin ser çand û xwezaya avê. Kom dikarin bala xwe ji bo jîyana rojane û çanda ku bi avê ra têkildar e, zêde bikin. Armanc ev e ku hîn bibin, pirsan bikin û bersivan ji mirovên derdora xwe bibhîzin û bibînin - ev ne tenê berhevkirina agahîyan e, lê çêkirin û tecrûbekirin divê bibe navenda vê amûra çandî. Kesên atolyeyê bi rê ve dibin ne hewce ye ku zanyarîyên wan yên pêşîn hebin da van çalakîyan bicîh bînin. Zêdetir agahî li ser avê dikarin di amûrê da werin dîtin yan jî bi lêgerînên kesane werin peydakirin.

Ji ber vê, bifikire ka tu dixwazî çi bi koma xwe ra parve bikî û çalakîyên guncaw hilbijêre. Ew dikarin bi awayekî azad werin tevlihevkirin, û her kes tê vexwendin ku çalakîyên nû biceribîne û lê zêde bike.

*Çalakîyên vê amûrê ji hevkarîya Lotta Schäfer, Şermin Güven û João Albertini li derdora pêşangeha Wasserspiegel – Water Bodies û amûra çandî ÇEM JIYANÊ NEXŞ DIKIN pêk hatine.*

## ÇALAKÎYÊN LI SER ÇEMÎ

### HERIKÎN

*Rêbername ji bo komê:*
Li kêleka çemî tiştên xwezayî berhev bikin ku ji bo çêkirina kelek yan keştîyekê dikarin werin bikaranîn. Divê ew li ser avê bisekine, ji ber vê yekê dema hilbijartina materyalan baldar bin. Gava kelekên we amade bûn, careke din temaşe bikin û paşê wan biavêjin avê. Li dû kelekê biçin, heya ku hûn dikarin li kêleka çemî bisekinin. Dema ku hûn êdî wê nebînin, vegerin xala destpêkê. Gava hemî kom vegerîn, çavdêrîyên xwe ji hev ra bibêjin ka we çi dît.

*Amadekarî û materyal:*
Cîyekî li kêleka çemê bibînin ku beşdar bikarin ji bo demekê li dû kelekê biçin yan jî herîkêm temaşe bikin ka ew çawa diçe. Ji bo girêdana kelekan, benek ji materyaleke xwezayî (mîna qamîş yan jî darikên nerm) bînin. Heger ji bo komê dijwar be ku li ser çavdêrîyên xwe biaxivin, hûn dikarin van pirsan bikin: We çi gîya, ajalên avî yan jî heyberên avê dîtin? Di çemê de suret yan lezên cihêreng hebûn? Yan jî astengî hebûn? Hûn difikirin ku keleka we dê bigihêje kuderê?

### AFIRANDIN / ÇÊKIRIN

*Rêbername ji bo komê:*
Her kes sedefan berhev bike. Paşê sedefan nîşanî hev bidin, gelo cudahîyên wan hene? Ferqên heyî rave bikin. Çima av û çem ji sedefan re hewce ne? Ji bo vê yekê, bi komên piçûk (2-4 kesî) li hev bikin û paşê bi hev re nexşekê ji sedefan çêkin. Gava hemî qedîyan, hûn dikarin pêşengehke piçûk pê çêkin.

*Amadekarî û materyal:*
Cîyekî li kêleka çemî yan li beravê bibînin ku gelek sedef lê hebin. Heger sedef bes nebûn, hûn dikarin bi kevir û pelan nexşa xwe temam bikin. Bi komê ra li ser fonksîyona sedefan, ku avê paqij dikin, biaxivin.

## TOR

*Rêbername ji bo komê:*
Bibin çend komên dukesî. Her cotek dê torek û satilekê bistîne. Cîyek nizm li kêleka avê hilbijêrin û dest bi kêşanê bikin. Bi baldarî hereket bikin, kevirên hûr bizivirînin û hewl nedin ku gelek qûmê ji binê avê bilind bikin. Hûn dikarin ajalên avî û nebatan di satilê da temaşe bikin. We çend cûre candar dîtin? Çi bala we kişand? Gelo hûn navên wan candaran dizanin? Heger na, hinek navan bidin ser wan. Gava ku karê we qedîyan, satilê dîsa di avê da vala bikin.

*Amadekarî û materyal:*
Ji bo nîvê komê tor hewce ne – tor dikarin bi darikê cilan û goreyan bên çêkirin. Nîvê din jî satilan werdigirin, heger bibe bira satil şefaf û transparent bin, da ku beşdar nebat û ajalên avî baştir bibînin. Mercek/rojikên mezin yan jî lênûskên nasîna candaran ne pêwîst in, lê dikarin balkêş bin. Hilbijartina navan ji bo candaran, têkilîyek bi wan ra ava dike û cihêrengîya jîngeha avî nîşan dide.

# ÇALAKÎYÊN JI BO BÛYERÊN ÇANDÎ Û XWEZAYÎ

## ŞÎYARBÛNA BIHARÊ

*Rêbername ji bo komê:*
Bêguman we gelek caran  Newroz pîroz kirîye – lê gelo hûn qet fikirîne ka Newroz çawa di xwezayê da xuya dike? Demekê bisekinin û fikir bikin ka di çend hefteyên berî Newrozê û piştî Newrozê da çi tê serê  xwezayê. Her kes sê bûyeran binivîse. Piştre ji dê û bav û kalên xwe bipirsin, ka ji Newroza dema zarokatîya wan da çi bûyerên xwezayî tên bîra wan. Gelo guherînek çêbûye?

*Amadekarî û materyal:*
Ev çalakî ji bo meha Adarê baş e, lê dikare li ser şahîyên din ên ku bi xwezayê ve girêdayî ne jî were sepandin. Armanc ew e ku bandora şert û mercên hewayî û klîmayê li ser riwek û nebatan bê berçavkirin. Hûn dikarin çend hefteyan berî û piştî Newrozê sê rojan derkevin derve û li xwezayê binêrin – wek mînak, bi wêneyan yan jî xêzkêşan qeyd bikin ka kîjan nebat bişkivîn û belkî jî gul vekirine.

## EVÎN

*Rêbername ji bo komê:*
Îro em dê Sêveke Mêxekrêj ya taybet çêkin. Gava ku hûn sêva xwe bi mêxekan dadigirin, li ser dîmena avê û çemî bifikirin û bihizirin ka hûn ji bo çi spasdarê avê ne. Piştre, helbesteke kurt binivîsin yan jî nameyeke evînê ji bo kesê/a ku hûn dixwazin sêva xwe bidin wê/wî, û ji wan ra derbarê evîna xwe ya ji bo avê bibêje.



*Amadekarî û materyal:*
Ji bo her kesî sêvek û bi qasî ku pêwîst be mêxek hewce ne. Ji bo helbest yan nameyê kaxez û qelemê amade bikin. Gelo hûn çîrokên ku di beşa Firat – Girêdayîbûn, Evînê da hatine behskirin dizanin? Gava ku hûn sêvan bi mêxekan dadigirin, ji hev ra wan çîrokan bibêjin yan jî destpêkê helbestek yan çîrokekê li ser evîn û avê bixwînin.

## BARAN Û STRAN

*Rêbername ji bo komê:*
Li taxa xwe Bûka Baranê çêkin. Ji materyalên xwezayî û parçeyên cilan Bûka Baranê çêbikin. Versîyonek ji strana Bûka Baranê hilbijêrin yan jî straneke nû bi xwe çêkin. Li zîlên derîyan xin û stranê xwe pê ra bixwînin! Heger derfet çêbe ji cîranan bipirsin: ka gelo ew ava baranê kom dikin? Çawa kom dikin?

Di komê da ji hev bipirsin: gelo ji bo her kesî têr av heye?
Çima baran hindik dibare?
Gelo Bûka Baranê ji bilî baranê çi tiştên din bi xwe ra tîne?

*Amadekarî û materyal:*
Darik, destikê gêsî, û parçeyên qumaşan an cilên kevn. Bifikirin ka hûn dikarin vê ayînê/rêûresmê li ku derê bi rê ve bibin û hûn dikarin kê vexwînin.

# ÇALAKÎYÊN JI BO QIRÊDANA BI AVÊ

## DAR NASÎN

*Rêbername ji bo komê:*
Her kes li dorhêlê ji xwe ra darekê hilbijêre. Gelo darek bi taybetî bala te dikişîne? Ji kerema xwe baldar bin ku têra we cih ji we ra heye, da ku bêyî astengî ji nêz ve darê nas bikin. Niha dema we heye ku hûn dara xwe bi çend gavan çêtir nas bikin:

1) **Li binê darê xwe dirêj kin yan rûnin û li qurmê darê temaşe bikin. Ew çawa ye? Çi bala te kişand?**
2) **Ji dûr û nêzîk da li darê temaşe bikin. Dar çawa bilind bûye?**
3) **Çavên xwe bigirin û li ser dengên dordora darê fokus bikin. Gelo hûn dengê bayê di nava şaxe yan pelên darê de dibihîzin? Yan jî candarên din?**
4) **Bêyî ku kesê/a din te bibîne, hewl bide xwe wek darekê bibîne. Gelo tu dikarî bi awayekî laşê xwe (stûnê darê), milên xwe (qurm) û lingên xwe (reh) darê temsîl bikî?**

Gava ku ew xelas kir, dîsa li hev bicivin û darên xwe bi pantomîmê nîşanî hev bidin. Paşê yên din hewl bidin ku dara rast texmîn bikin.





*Amadekarî û materyal:*
Ji bo vê çalakîyê cihekê bibînin ku lê darên cihêreng û taybet hene. Armanc ew e ku taybetîya her darekê were dîtin û bi wan daran ra empatî were çêkirin. Di destpêkê de ji komê ra hin mînakên taybetîyên darê bide, wek mînak bi rêya mezinbûna şaxan.:
Darên zirav û nazik dikarin xweşik xuya bikin.
Darên bi qurmê stûr xurt xuya dikin.
Darên bîyê (şengebî) bi şaxên xwe yên berjêr ve girêdayî, dibe ku xemgîn xuya bikin. Heger we dem û hewes heye, hûn dikarin piştî vê çalakîyê jî çîroka jîyana darê binivîsin.

## TAM KIRIN / TAMA XWEŞ / TAMANDIN


*Rêbername ji bo komê:*
Her kes bila nîvê şûşeyekê bi avê dagire (avê ji kanî yan jî ji çemî). Niha bila her kes biçe û ava xwe bitamîne. Çawa? Materyalên ku ava te xweştir dikin yan jî yên ku ava te baştir dikin, berhev bike. Navekî li ava xwe bike û li ser etîketa şûşeya xwe binivîse. Bifikire ka çi tişt ava te wisa biha dike. Gava her kes ev yek kir û xelas bû, bila her kes ava xwe ya biqîmet bo komê rave bike.

*Amadekarî û materyal:*
Ji bo her kesekî/ê şûşeyeke vala, şefaf û bi devik pêwîst e. Tu dikarî materyalên etîketan jî bînî, ku dikarin li ser şûşeyê yan li gerdenê şûşeyê werin zeliqandin. Cîhekê li derve bibînin ku hûn bikarin av û madeyên xwezayî lê peyda bikin, yan jî baxçeyekê ku darên bêhnxweş lê çêdibin, ku dikarin avê zengîntir bikin.

## PUZEL

*Rêbername ji bo komê:*
Li xerîteya sîstema çemên Firat, Dîcle û Xaburê baş mêze bikin. Paşê pelê bizivirînin û parçe parçe bikin. Gava qedîya, puzela xwe bi ya hevalê/a xwe ve biguherîne û hewl bide ku sîstema çeman dîsa bi hev re bikî.

*Amadekarî û materyal:*
Xerîta şebekeya çemên yên Şermîn Güven li hundirê zarfê kopî bikin.
Hûn dikarin ji bo her kesekê yekê çêkin, yan jî wek komeke biçûk parve bikin.
Ji bilî vê, ji bo her kesê meqes hewce ye. Hûn dikarin hewl bidin cihê xwe di şebekeya çeman de bibînin, ji bo vê hûn dikarin xerîteyên online bikar bînin da ku berawird bikin.





## RAVE BIKIN Û GUHDARÎ BIKIN

*Rêbername ji bo komê:*
*Li çîroka Narges Mohammadîyê bi baldarî mêze bikin. Komên dukesî ava bikin û çîroka  çemî ji hev ra vebêjin. Hewl bidin ji perspektîva çemî biaxivin, ji ber ku çem karakterê sereke yê çîrokê ye.*

*Amadekarî û materyal:*
Leporello bi wêneyên xwe ve wisa tê danîn ku her kes bikare bibîne. Li vir baldarî li ser xeyal û ramanên beşdaran bikin: hûn çend şiroveyên cuda ji vê çîroka wêneyî dikarin bidest bixin? Herwisa çem wekî kesayetekî bi pêwîstîyên xwe û mafê jîyaneke rûmetdar dikare bi rêya cilda amûrê û çîroka komê were nîqaşkirin,

# ÇALAKÎYÊN JI BO XEMXURÎYA AVÊ

## BIRÊVEBIRIN

*Rêbernameya ji bo komê:*
Derkevin derve û li nebat yan darekê bigerin ku tî xuya bike. Her kesek dê borîyekê bistîne. Bi hev ra bifikirin ka hûn çawa bicivin da ku borî bigihêjin hev û av bi qasî ku mimkin e bêwindabûn bigihêje armancê. Gava hûn amade bûn, avê bixin nav borî. Vî karî wisa bidomînin heya ku tenê çend dilop av winda bibe.

*Amadekarî û materyal:*
Ji bo her kesekê borîyek, lûleyeke baranê yan hortek hewce ye. Lîderê lîstikê firaqa avê heye. Her materyalek ku av bikare tê da bihereke, dikare bê bikaranîn. Ji bo îlhamê, hûn dikarin strana **Şamîranê** ji beşa **Kanal û baran di stranên gelêrî de ji bo erdekî zindî** guhdarî bikin. Armanc avakirina xeteka lûleya avê ya hevpar e, da ku were fikirîn ka çawa mirov dikare bi awayekî dîyar (mînak kanalên avdanê) yan nepenî (mînak borîyên ava gemarî) avê bi rê ve dibin da ku li gorî berjewendîyên  xwe bi kar bînin.
Li vê derê bendav û golên avê û belavkirina nedadwerane ya avê (mînak di çandinîyê de) dikarin bibin mijara axaftinê.



# LÊNIHÊRÎN

*Rêbername ji bo komê:*
Bi hev re bifikirin ka hûn çawa dikarin wekî kom xemxurîya avê bikin. Gelo li derdora we avzêmek heye ku li ber xeterê be? Yan jî projeyeke pîşesazîyê heye ku gelek ava binerdê jê ra pêwîst be?

Maneya „berxwedan ji bo yan dijberîya tiştekî kirin“ çi ye?
Maneya „xebarkirina ji bo avzêmekê û lênihêrîna avê“ çi ye?

Formên parastinê û protestoyê ku hûn dizanin berhev bikin. Paşê bi hev ra biryar bidin ka hûn ê kîjan çalakîyê pêk bînin û piştgiran vexwînin.

*Amadekarî û materyal:*
Kîjan çem di bin xeterê da ye? Pêwîstîya kîjan avzêmê bi parastin yan lênihêrînê heye? Li ku derê av kêm digihêje wir? Bifikirin ka hûn dikarin çi bikin, çi ji destê we tê û xeterên ku dibe ku derkevin pêşîya we çi ne?
Di vê çarçoveyê de hûn (bi tenê yan bi komê ra) dikarin biryar bidin ka hûn ê hem bi konseptên parastina avê/lênihêrîna avê û hem jî bi protestoyan û berpirsîyaran wek daîreya avê, şirket, şaredar ra mijûl bibin yan jî li ser çalakîyeka taybet bifikirin.

Mînakên parastina avê: Çalakîyên paqijkirina avêtî, çandina nebatan li kêleka avê, parzûnkirina ava gemar, pasewanî yan jî dorgirtina li ser avê.
Mînakên protestoyê: Flashmob, çalakîyên wêneyan, afîş, meş, name şandin ji bo berpirsîyaran.

# COTKARÎ


*Rêbername ji bo komê:*
Bihev ra serdana çandinîyekê li derdora xwe bikin. Berî wê, hemû pirsên ku dixwazin derbarê bikaranîna avê da ji cotkaran bipirsin berhev bikin. Gava kesek mezra û zevî nîşanî we dan, bala xwe bidin ka av li ku derê tê bikaranîn û pirsên xwe zelal bikin. Di xwezayê da û di têkilîyên mirovan da danûstandin girîng e, ji cotkaran bipirsin ka hûn çawa dikarin îro alîkarîya wan bikin, li mezrayê gelek kar hene ku dikarin bêne kirin.

*Amadekarî û materyal:*
Gelo di malbata we da yan di nava hevalên we da cotkar hene? Li derdora xwe mezrayekê peyda bikin ku rêbazên kevnar yên cotkarîyê bi kar tînin. Gelo hûn dikarin înîsîyatîfên ekolojîk yên cotkarîyê jî li derdora xwe bibînin?
Di vê vîdyoyê da cotkar Bişar Îçlî dibêje ka cotkarîya ekolojîk çawa ye.

Ji cotkaran bipirsin ka kom dikare serdana wan bike û ew çi dibêjin li ser bikaranîna avê. Hûn dikarin pêşnîyar alîkarîyê li mezrayê bikin.

Av li ku derê tê bikaranîn? Kengê kêm dibe? Gelo mezra kom dike? Cotkar çawa bi hişkesalîyê ra dijîn? Gelo bankeke tovên kevn heye? Çima ev yek di têkilîya avê da girîng in?





# DÎSA BELAV KIRIN Û PARASTIN

*Rêbernameya ji bo komên ciwantir:*
Guhdarî avê bikin. Tiştên ku av dixwaze wêne bikin. Gava her kes wêneya xwe amade kir, hûn dikarin rûpelan wek çemekî bi hev ve bikin û binêrin ka gelo we hemûyan tiştên wekhev bihîstine.

*Rêbername ji bo komên mezintir:*
Xwedîkirina avê ji bo mirovan demek dirêj e ku mijareke girîng e. Di dîroka Mezopotamyayê da qanûna Hammurabî hebû, yek ji qanûnên herî kevn ên li ser bikaranîna avê. Li vê qanûnê baş mêze bikin. Mafên avê çi bûn? Gelo hûn agahîyên li ser belavkirina adilane ya avê dibînin?

Niha bifikirin ka kîjan maf hîn îro jî bikêrhatî ne û kîjan divê werin zêdekirin. Her kesek mafekê li ser rûpelekê binivîse. Gava we qedand, hemû rûpelan bi hev ve kin û bi hev ra li Qanûna xwe ya Avê temaşe bikin.

*Amadekarî û materyal:*
Ji bo her kesê/î kaxez û qelem hewce ne. Ji bo çêkirina leporelloyê lezq hewce ye. Leporello çend rûpel in ku wêneyeke mezin çêdikin, ji bo vê hûn dikarin wê wek wêneyên vê amûrê bitewînin yan jî bi zelqokê ji piştê ve bi hev ve bikin. Ji bo Qanûna Hammurabî pirtûk, malper yan jî kesên derdora xwe bibînin û pirs bikin.

